Ebdulrahman Efîf*

Berî ku ev bask bi dengê firê kevin

Wilo bi baskekî şikestî ji payîzî
Bi şibakak dûrî tenê
Bi hinek pirtuqal û êvarekê sar
Û mûma li ser masê her xwe liba dike
Li rûyê te...li ser mirinê û tenêbûnê û
Ser rûyekî din ku di bin her rûyî de ye:
Rûyê agirê mûmê bi xwe.
Ezê di xwe de riya bexçê xwedê nas bikim
Navê melayîketê mezin û baskên wan wê bi refan
Li hev kevin dema ez ji keçek insanan hez bikim
Nabêjin mixabin !? wê rûnin li ber deriyê dil wê bendewariyê
Bikin...bi navên xwe yê giran bi baskên xwe yên dirêj
Pir bi bêhinferehî, bi xweşikbûn û nermahiya komek dayikan.

Berî ku ev bask bi dengê firê keve
Berî ku gul bi bihna baranê keve
Û ez bi lêvê jibîrkirinê kevim
Berî em hew xwe di memikê gula de bibînin
Ev hewş bibe ba û me di dawa xwe de biperpitîne
Berî tu wilo ji me hez bikî û wilo me dûrî xwe bikî
Ka ji me re bêj :ez hûn im,
Ka bêj:
Hûn ez im.

Ez bi tenê di vê newalê de
Avek pir hindik ji lehiyê maye
Belkî xarek pir reng jî di binê kortikekê de be
Belkî kerek ji dûr ve bizire
Belkî mêwên tirî yên biçûk hinekî nig û şaxê xwe berdin bi vî aliyê çem de
Her tişt tenê ye wek ku ew aniha berî deqakê çêbû be
Hertişt wilo tije ruhnî ye
Tê bê qey xwedê di hindirê hertiştî de dirame.

Teşqelên sîkê û ev minara han
Û gulê di hewşa minarê de û camî
Û destê te yî xweşik, xwendina bekelorya,
Zivistan û havîn û dîsa buhar.Hingulîsk,jinanîn,
Berdan û teşqelên helbestan û ruhnîya tarîbûna
Xweşikbûna te,
Ev hemû bes in ji nivîsandina pirtûkekê re ?
Yan ezê çawa bikim !?
Ezê hertiştî ji bîra bikim û te tenê....wê hezkirina te
Wek azana berbangê hilkişe û hilkişe
Zelal û xurt, wê zengilê canê miriya
Ji xew rake.

*** Helbestvanekî Kurdistana rojava ye, li Elmaniya**

EZ DIBÊJIM

Barwîr Sîvak
wergerandin: S.Isa

Ez dikarim bêjim:
ku ev ava girikî zelal û bijwên e.
ez dikarim bêjim:
ku ev kox qesreke hêja ye.
ez dikarim bêjim:
ku ev dûman komereke Kevirê reş î himhimî ye ,
û ev cawê sor yê nazik
ne tevn e, belê revîn û agir e....
tevî çiya û newalên di nav bera me de
ez dikarim bêjim
tu nêzîkî min î.
ez dikarim bêjim:
tu miroveke fihtok û ne kubar î,
tevî ku bi rastî
te hayî ji min jî tune ye.
ez dikarim bêjim:
ev nivistin hişyarî ye,
û ev neqezenc kirina bi kul
serkeftineke hêja ye
mîna wê ne ciryan e,
û ev zerdele ... Qoriyekî mezin e,
û ev darûbestkirin xweş semawend e
û ev çiya ... Qonçaleke mezin e dernixûn kirî ye,
û ev tiliya min
ya qelekûçik pênûseke piçuk e.
ez dikarim bêjim
lê bê sûde ye .....?

QENDÎL
Rojnameke WÊJEYÎ, ROŞENBÎRÎ, GIŞTÎ, SERBIXWE
Li 2 sibatê 2001 hatiye damezrandin
Sernivîser: Mirza H. Dinnayi
Redaksion: Fewzî Çelîk; Hussein Nermo;
Pêywendî: Şivan Şêx Elo; Serhan Isa / Grafik: Mervan derkî
Çapkirin û belavkirin Qendil Verlag
Copyright Qendil 2002 / ISSN 1617-5174
Navnîşan: QENDIL
Postfach 150 265
D- 07714 Jena / Germany
Fax: 03641 238728
Email: webmaster@qendil.de
Beşê kurdî
PF 219118, 33604 Bielefeld
Abona Salane: 21 Euro – li gel Postekirin
Bankverbindung:
Empfänger: Zeitungsverlag / Kontonummer: 649 063 104
BLZ: 100 100 10 / Bei: Postbank Berlin

Ji buhayên êzdiytiyê

IDO BABAŞÊX

RASTÎ RÊYA YEZDA YE

Piraniya ol û baweriyan li cîhanê dixwazin rêya rast û durist nîşanî mirovan bidin û hewl didin ku dûrî rêya xwar û xerab bin, ji ber vê çendê êzidiyatiyê jî pir guh daye rastîyê û wekû karekî pir buha û qedir giran nasiye.
Êzîdî herdem dibêjin **rastî rêya xwedê ye** û pêdiviya mirov her rastiyê bigrit û ev e di van sebeqan de hatiye:
Ya xwedê rêya te rastî ye
Û karê te bi heqî ye
Surra te here mixfî ye
.....
rêya xwedê min rastî ye
padşa ye û şik tê nîn e
xwedê melekê bêrî ye (1)
ev herdû sebeqe bi ron û aşkere rastî bi xwedê ve girê didin û diyar dikin ku mirovên rastgot û
rastperwer bit nêzîkî xwedê ye.herwisa êzidiyatî ji mirov re diyar dikit ku rastî rêya zanînê ye û dilê mirovî bi rastiyê ron dibit,wekû di vê sebeqê de hatiye:
rastiya rê zan e
ronaya dilan e
rastî rêya yezdan e (2)
rastî ma'rîfet û zanîn e ,her kesekî dûrî rastiyê bit li dunya din dê giyanê wî rûbirûyî nexweşî û azara bit û ev qewil vê çendê diyar diket:
rastî ma'rîfet e
mêrê qebihi terbiyet e
li axretê giyanê wî bê e'zet e (3)
me got rastî tiştekî pir buha ye,
mirovên rastgot her xwe radigirin û herdem baweriya wan î mukume û hêvî û omîdên wan bi xwedê hene,wekû ji me re xweye dibit:
rastî binyat zêr e
wan cindiya xwe ragêr e
yê herdem hêvî bi xwedê re
.....
rstî binyata xas e
wa ji sihabê ew mekas e
yê ji xwedê xwe bitirse nas e (4)
êzidiyatî olê û rastiyê bi hev re têkildar diket û girîvan ku her êzidiyek pêdivî ye li ber xwe ve bikit, bi girîvanê rastiyê didet nasîn û qewlekî me wesa dibêjit:
ji qewlê pîr xidir e
hinciyê girîvanê rastiyê li ber e
şikir dê çite dîwana mal û ser e
hêvîdar im em di gotin, kar û kiryarên xwe de rastgot û rastperwer bin, bi mirov,heval, dost û xelkê xwe re dilrast bin.

Jêder:
1-qewlê padşayî,berhevkirin:Xêrî Bozanî LALIŞ jimar (8).1997.Dihok
2-3-4-qewlê silavêt melekê kerîm,berhevkirin Mişûr Şemo, LALIŞ jimar (11) Tebax 1999 Dihok
.

Çakbînî

Xemcivîn*

Hoy... Hoy ...!
Çav ji min dipirsin;
şiyar û vekirî bi Stêrikan re diçirisin...
deng deng li newalan bela bû,
bi çiyê ve dihilperikî...!!
bi bayê re hevrê me, te nabînim..te nabînim..
bi Qolingê zozên re hêviyan dixwînim;
tu dibêjî: berovajî buhar tê
Adar û Tebax bûne du baskên xewnekê!!
geriyam li te, ez geriyam.. Bêrîvanî hatin û hatin..
meş rewan Qaz û Qumrî û Qitik hatin
Ewir Mij û Moran bînahiya min girtin..!!
Çav li ber xilmaşbûnê ne;
bi peyv in.. bi pirs in... ne di nav Peşk û dilopên Baranê de
ne di nav leylanê de,
û ne di Bahoza bendewariyê de
li hemû dever û aliyan te nabînim...te nabînim...
xewnê.. xewnê...dilê min ji lêgerînê ne weste..
şevîngerim; şivan û pêwan im li ber hêrana derdan Qeraş im..!!
sibehîn, êvar û berbangê, hawar û fîxanê di dêrim..
Qebqeba Kewê nêr im, her gav li zinarê evînê, sirûdan dixwînim
bi hêvî me; bi vê qîrînê te bi gehînim...!!!
heger tu xewn bî, ezê bêjim, eger tu leylan bî, ezê bêjim,
tu strana min î; ma çawa ezê te nebêjim?
Kaniya evîna me diherike li bin siya biyok û çinaran,
li ber bihna nêrgiz û sosinan;
çirûskek li ser avê, beramber min geş dibe,
yekçar ji çavan min bawer nedikir.!!
lê!! çi bikim Dilê min dikele,
Dilê min înan û baweriyê, bi cî dike...!!?
Ava sar û hênik dibişire...!! kenekî biçûk ji lêvan der tê,
wêneyê te di roniya Heyvê de;
şanî min dike..;
û dibêje: fermo hey çakbînî

*Helbestvanekî Kurdistana rojava ya, li Dubai, Imarat dimîne.